**Bultena heftane**

**23/12/2023**

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

**Nûçeyên ji cîhanê**

## Polîsên DYA'yê jinek reşik qetil kir

Li bajarê Los Angeles ya DYA'yê jina reşik a ku îxbara tundiya din av malê de kir, ji aliyê polîsan ve bi dehan caran hate gulebarankirin û hate qetilkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/polisen-dya-ye-jinek-resik-qetil-kir-42721

Çavkanî:JINHA



## Li Belçîkayê sedî 95'ê jinan xwe li kolanan bi ewle hîs nakin

Li gor ankêta li Belçîkayê çêbû, sedî 95'ê jinan xwe li kolanan bi ewle hîs nakin.

https://anfkurdi.com/jin/li-belcikaye-sedi-95-e-jinan-li-kolanan-bi-ewle-his-nakin-177323

Çavkanî:ANF



# [Li Mexribê jin şeva erdhejê jî bi tundiyê re rûbirû hatin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-mexribe-jin-seva-erdheje-ji-bi-tundiye-re-rubiru-hatin-42707)

Komeleya Jin û Zarokan a Nakhîl ku salên dirêj e li Marakeşê li dijî tundiya zayendî ya civakî têdikoşe, bi derfetên weke 'Navendên Guhdarkirinê' û 'Xeta Kesk' ji bo parastina jinan a ji tundiyê xebatên piralî bi jiyanî dike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-mexribe-jin-seva-erdheje-ji-bi-tundiye-re-rubiru-hatin-42707

Çavkanî:JINHA



# Jinên Mexrîbê li dijî tundiyê daxwaza zagonên xweser dikin

Li Mexrîbê qetliamên jinan her ku diçe dibe sedema fikaran. Parêzvanên mafê jinan balkişandin ku zagona ku li Mexrîbê di sala 2018'an derket kêm dimîne û daxwaz kirin ku zagonên berfireh û xweser werin derxistin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-mexribe-li-diji-tundiye-daxwaza-zagonen-xweser-dikin-42717



## [Lîstika 'Ez Rosa Luxemburg ' li Amedê bi temaşevanan re hat cem hev](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/listika-ez-rosa-luxemburg-li-amede-bi-temasevanan-re-hat-cem-hev-42726)

Lîstika şanoyê ya yek kesî a bi navê "Ez Rosa Luxemburg " ku Jûlîde Kural dileyîze, li Şanoya Bajêr a Amedê bi temaşevanan re hat cem hev.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/listika-ez-rosa-luxemburg-li-amede-bi-temasevanan-re-hat-cem-hev-42726

Çavkanî:JINHA




## Zaroka ku bi giliya êşa ling çû nexweşxanê ducanî derket

Derket holê ku li Mêrdinê zarokek ku di meha Îlonê de bi giliya êşa ling çû nexweşxanêyê, 29 heftî ducanî ye. Li ser îfadeya zarok bira wê D.G. ku bi awayekî pergalî destdirêjiyê li zarokê kir û gef lê xwar, hat girtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zaroka-ku-bi-giliya-esa-ling-cu-nexwesxane-ducani-derket-42733

Çavkanî:JINHA



## ‘Divê jinên Tûnisî tirsa xwe ya ji otorîteyê bişkînin’

Tûnis di 24’ê Kanûnê de diçe hilbijartinê. Aktîvîsta femînîst Hadîa Belhaj Youssef, bang li jinan kir û wiha got: "Êdî dema şikandina bariyerên tirsa otorîteyê hat.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-jinen-tunisi-tirsa-xwe-ya-ji-otoriteye-biskinin-42737

Çavkanî:JINHA



## Bi berhemên xwe çanda Kurdî zindî dike

Jina ciwan Zehra Newzad ku bi berhemên destan çanda Kurdî zîndî dike diyar kir ku Her çend ew mamostehiyê weke erka xwe yê sereke dibîne jî her du karan bi hev re kirin ji bo wê cihê kêfxweşiyê ye.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/bi-berhemen-xwe-canda-kurdi-zindi-dike-42740

Çavkanî:JINHA



## ‘Hikumeta başûrê Kurdistanê li dijî rojnamevanên azad sûc dike’

Rojnamevan Mestûre Mehmûd diyar kir ku desthilatdariya başûrê Kurdistanê mafên rojnamegerên ku li pêy şopa rastiyê dikevin binpê dike, sûcan dixin stuyê wan û wan davêjin girtîgehan.

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/hikumeta-basure-kurdistane-li-diji-rojnamevanen-azad-suc-dike-42741

Çavkanî:JINHA



## ‘Ji bo başkirina rewşa siyasî divê jin çalakiyên xwe xurtir bikin’

Soz Abdulqadir a derbarê rewşa siyasî a herêma Kurdistanê axivî, diyar kir ku siyaseta herema Kurdistanê ber bi xirabûnê ve diçe û wiha got:“Ji bo rewşa siyasî baş bibe divê jin kar û çalakiyên xwe hê xurtir bikin û wekheviya zayendî biparêzin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-baskirina-rewsa-siyasi-dive-jin-calakiyen-xwe-xurtir-bikin-42751

Çavkanî:JINHA



## [Sara Reza: Li ser şopa Sakîne û Evîn em ê têkoşînê bilind bikin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/sara-reza-li-ser-sopa-sakine-u-evin-em-e-tekosine-bilind-bikin-42752)

Endama Tevgera Azadiya Komeleya Kurdistanê Sara Reza di salvegera Duyemîn Komkujiya Parîsê de Evîn Goyî bibîr anî û got, “Em ê li ser riya şehîdan bimeşin û têkoşîna wan bilind bikin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/sara-reza-li-ser-sopa-sakine-u-evin-em-e-tekosine-bilind-bikin-42752

Çavkanî:JINHA



## [Li Tûnisê hilbijartin: Divê jin dengê xwe bikar bînin](https://jinhaagency.com/ku/siyaset/li-tunise-hilbijartin-dive-jin-denge-xwe-bikar-binin-42757)

Rêvebera Projeya Tora Çavdêran Rahma Al-Bouhlî diyar kir ku li Tûnisê di hilbijartinên Konseya Neteweyî ya Cihî û Herêmî de ji bo pêşî li binpekirinan bigrin koman ava kirine û bang li jinan kir ku li mafên xwe xwedî derkevin dengê xwe bidin.

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/li-tunise-hilbijartin-dive-jin-denge-xwe-bikar-binin-42757

Çavkanî:JINHA



## 'Bi hatina qeyûman re ji jinan re qad nema'

AMED - Jinên Amedî diyar kirin ku qeyûmên ji aliyê dewletê ve tayînî şaredariyên ku gel bi îradeya xwe bi dest xistine hatin kirin, sazî û komeleyên jinan ên li bajêr girtin û diyar kirin ku van qeyûman ji jinan re qad nehiştine.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/223591?page=2

Çavkanî:JINNEWS




## Berxwedana Ozak Tekstîl: Li hundir patron, li derve jî zextên walîtiyê!

RIHA - Li dijî zextan berxwedana karkerên Febrîqeya Tekstîlê ya Ozakê berdewam dike, karkeran diyar kirin ku heta daxwazên wan neyên bicihanîn dê berxwedana xwe bidomînin û gotin: "Patron li hundir û walî jî li derve zextan dikin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/223593?page=2

Çavkanî:JINNEWS



## Fîgen Şahîn a girtî: Dê roj bibe roja me!

ÎZMÎR - Fîgen Şahîn a li Girtîgeha Şakranê di greva birçîbûnê de ye, di axaftina xwe ya telefonê ya bi malbata xwe re peyama “Ev roj dê bibe roja me” da.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/223606?page=2

Çavkanî:JINNEWS




## Li Amedê li dibistanekê xwendekar jehrî bûn

AMED - Li navçeya Rezan a Amedê li Dibistana Navîn a Îmam Hatîp ya Çelebî Eserê di çarçoveya ‘Hefteya Xurekên Herêmî’ de bernameyek pêk hat û hat hînbûn ku di bernameyê de gelek xwendekar ji ber xurekan jehrî bûne.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/223634?page=2

Çavkanî:JINNEWS



## 'Em bi kurdî li dijî êrişan bibin bersiv'

STENBOL - Hevseroka Komeleya Lêkolînên Kurdî Remziye Alparslan diyar kir ku ji bo kursên serdema nû eleqeyek baş heye û wiha got:"Divê em li têkoşîna xwe xwedî derkevin. Ev rê jî ji kurdî derbas dibe. Li dijî hemû polîtîkayên asîmîlasyonê ji bo atolyeyên me yên kurdî eleqeyek baş heye û ev bi awayekî bi hêz dewam dike. Li dijî hemû êrişan em bi zimanê xwe bibin bersiv. Ez bang li hemû kesî dikim ku tevlî kursên kurdî û perwerdeya kurdî bibin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/223701?page=1

Çavkanî:JINNEWS




## Ballikaya: Em li ser xeta azadiya jinê bi biryar in

Ji Meclîsa Jinê ya DEM Partiyê Several Ballikaya diyar kir ku ew bi biryar in, li gorgî pîvanên rêveberiya xwecihî ya demokratîk di hilbijartinên xwecihî de xeta azadîparêziya jinê bi cih bînin.

https://anfkurdi.com/jin/ballikaya-em-li-ser-xeta-azadiya-jine-bi-biryar-in-177298

Çavkanî:ANF



# [Li Pakistanê jin daketin qadan: Bi sedan jin û zarok hatin binçavkirin](https://anfkurdi.com/jin/li-pakistane-jin-daketin-qadan-bi-sedan-jin-u-zarok-hatin-bincavkirin-177279)

Li Pakistanê jin li dijî sûcên ku hêzên dewletê li hemberî Belûciyan pêk tînin, daketin kolanan. Polîsan bi sedan jin û zarok binçav kirin.

https://anfkurdi.com/jin/li-pakistane-jin-daketin-qadan-bi-sedan-jin-u-zarok-hatin-bincavkirin-177279

Çavkanî:ANF




# [Rejîma Îranê dest danî ser xelata Sakharov ya Jîna Emînî](https://hawarnews.com/kr/rejima-irane-dest-dani-ser-xelata-sakharov-ya-jina-emini)

Parêzerê malbata Jîna Emîn, piştî ku ji Fransayê vegeriya Tahranê, li balafirxaneyê ji aliyê hêzên ewlekariyê ve ket bin lêpirsînê. Rejîmê dest danî ser xelata Sakharov ya ji bo Jîna Emînî hatî dayîn.

https://hawarnews.com/kr/rejima-irane-dest-dani-ser-xelata-sakharov-ya-jina-emini

Çavkanî:ANHA



# [Encamnameya konferansa ‘100 saliya Lozan û rola jinên Başûrê Kurdistanê’ hate weşandin](https://rojnews.news/ku/?p=295820)

Encamnameya konferansa li Hewlêrê ya li ser ‘100 saliya Peymana Lozan û Rola Jinan ya di Parastina Xak û Nasnameyê de’ hate eşkerekirin.

https://rojnews.news/ku/?p=295820

Çavkanî:ROJNEWS



# [Bi hezaran Evîn, bûn evîndarê axa welatê xwe](https://rojnews.news/ku/?p=295918)

Pêngavên destpêkê yên Rêber Apo di salên 1973’an de avêtî li giştî Kurdistanên pêvajoyek nû ya jiyanê da destpê kirin. Niha ne tenê li Kurdistanê li tevayî Rojhilata Navîn û cîhanê bandorek mezin li ser hişmendiya mirovan çêdike. Ev têkoşîna mîna baranê rûyê axa Kurdistanê ji gemarî, bêdengî, xiyanet, namertiyê şuşt û bû ronahiya rojên tarî.

https://rojnews.news/ku/?p=295918

Çavkanî:ROJNEWS



## [Li Helebce jin kargehek ya vegerandina plastîkan birêve dibin](https://rojnews.news/ku/?p=295895)

Li Helebce kargehek ya cardin bikaranîna madeyên plastîk hatiye vekirin, rêveberiya kargehê li ser milê çend jinane ku roja têde kar dikin. Serpereştyara kargehê ku jine got; “Em dixwazîn gel di aliyê madeyên zererdar de hişyar bikin û jîngeha bajarê xwe ji madeyên plastîk paqij bikin.”

https://rojnews.news/ku/?p=295895

Çavkanî:ROJNEWS




## ‘Tundiya herî zêde di medyaya civakî û ragihandinê de li ser jinan tê kirin’

Çalakvana mafên jinan Razaw Mehmûd tekezî li wê yekê dike ku niha tundiya herî mezin ya rojane ya li ser jinê bi rêya medyaya civakî û medyayê ye û got; “Divê em hemû bi hev re li dijî hemû cûrên tundiya li ser jinê rawestin.”

https://rojnews.news/ku/?p=296004

Çavkanî:ROJNEWS



## [‘Li Misra jorîn jin di guherîna civakê de rolek mezin dilîzin’]

Martîna Mamed a ku hîn di 15 saliyê de dest bi rexnekirina jiyana ku ji bo jin û zarokên keç tê ferzkirin kiriye diyarkir ku li Misra jorîn, piştî guherîna ku di xwe de çêkiriye, niha ji bo jinên din têkoşînê dike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-misra-jorin-jin-di-guherina-civake-de-rolek-mezin-dilizin-42770

Çavkanî:JINHA



## Zeyneb Xoresan: Sala 2023 sala xwedî derketina li nirxan bû

Endama Desteya Rêveber a Komelgeha Azad û Demokratîk a Rojhilatê Kurdistanê (KODAR) Zeyneb Xoresan rewşa jinên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê nirxand û got: “Sala 2023’an xwenaskirin û xwedîderketina li û nirxan bû.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zeynep-xoresan-sala-2023-sala-xwedi-derketina-li-nirxan-bu-42767

Çavkanî:JINHA



## [Xebatkarên weşanxaneyê: Eleqeya ji bo Kurdî zêde ye](https://jinhaagency.com/ku/rojane/xebatkaren-wesanxaneye-eleqeya-ji-bo-kurdi-zede-bu-42766)

Ji bo Fuara Pirtûkan a Mezopotamyayê ya ku li Amedê tê lidarxistin eleqeyeke zêde hebû. Xebatkarên weşanxaneyê gotin ku ji ber zêdebûna bihayan firotin kêm buye û lê tevî bihabûnê jî eleqeya mezin a ji bo Kurdî balê dikişîne.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/xebatkaren-wesanxaneye-eleqeya-ji-bo-kurdi-zede-bu-42766

Çavkanî:JINHA




## [Jinên Başûrê Kurdistanê 2023’an bi tekoşînê derbas kirin – PANORAMA](https://jinhaagency.com/ku/dosya/jinen-basure-kurdistane-2023-an-bi-tekosine-derbas-kirin-panorama-42765)

Jinên RJAK’ê ên li Başûrê Kurdistanê sala 2023’anbi tekoşînê derbas kirin, bi çalakiyên xwe yên cûr bi cûr peyama jiyanek azad gengaze dan.

https://jinhaagency.com/ku/dosya/jinen-basure-kurdistane-2023-an-bi-tekosine-derbas-kirin-panorama-42765

Çavkanî:JINHA



## ‘Herî zêde êrîşî mafên jinan ê jiyanê tê kirin’

RIHA - Parêzer Fazîlet Taştan, diyar kir ku têkoşîna li dijî polîtîkaya bêcezahiştinê ya di bûyerên tundiyê de girîng e û got, "Divê qanûn bi bandor bên bicihanîn û jin li dijî tundiyê xwe rêxisitn bikin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/223877

Çavkanî:JINNEWS




## Cerdevanekî jina ku pê re zewicandibû qetil kir

WAN - Li Elbaqê cerdevan Fatih.Genco jina bi navê Çiğdem.Genco ya pê re zewicandibû bi çekêqetil kir.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/223935

Çavkanî:JINNEWS



## ‘Divê jin ji jêhatîbûna xwe bawer bin radestî tu kesî nebin’

Lubna Ezz Al-Din a ku ruxmê hemû astengiyan ji bo parastina hewirdorê, pêwçûn bi dawî bibe û jin tevlî her qadê jiyanê bibe xebatên xwe jiyanî dike got: “Divê jin ji jêhatîbûna xwe bawer be û radestî tu kesî nebin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-jin-ji-jehatibuna-xwe-bawer-bin-radesti-tu-kesi-nebin-42786

Çavkanî:JINHA



## Bi muzîk û wênekêşanê kêrhatina xwe der dike

Hensek Mihemed a ku bi hunerê re eleqeder dibe diyar kir ku jinên bi muzîkê re eleqedar dibin civak bi çavekî xirab li wan dinêre û got ji bo jin bigihîjin armanca xwe divê li hemberî hişmendiya mêrsalar ê di civakê de rawestin û wan astengiyan bişkînin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/bi-muzik-u-wenekesane-kerhatina-xwe-der-dike-42787

Çavkanî:JINHA



## Komeleya Amna ji bo jinên rastî tundiyê tên piştgiriyê dide

Komeleya Amna ya Parastina Jinên Rastî Êrîşa Zayendî tên, ji jinên rastî tundiyê tên re xizmetên derûnî, hiqûqî, pîşeyî, rênîşandan û şêwirmendiyê dide, li dijî çanda tundiyê ya di civakê de jî têdikoşe.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/komeleya-amna-ji-bo-jinen-rasti-tundiye-ten-pistgiriye-dide-42788

Çavkanî:JINHA



## Li Afganistanê di mehekê de yek jê rojnamevan 10 jin hatin qetilkirin

Li Afganistanê di meha dawiya salê de 10 jinên ku di navbera wan de rojnamevan Hasna Sedat jî hebû, ji aliyê Talîbanê ve hatin qetilkirin, mirina 2 jinan a bi guman jî weke 'xwekuştin' ket raporan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-afganistane-di-meheke-de-yek-je-rojnamevan-10-jin-hatin-qetilkirin-42791

Çavkanî:JINHA



## Zeyneb Celeliyan ruxmê nexweşiyên xwe nayê tedawîkirin

Girtiya siyasî a Kurd siyasetmedar Zeyneb Celaliyan ku ev 16 sale li girtîgeha Yezdê tê girtin ruxmê nexweşiyên wê nayê dermankirin û hevdîtina wê ya bi mabatê re tê astengkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zeyneb-celeliyan-ruxme-nexwesiyen-xwe-naye-tedawikirin-42792

Çavkanî:JINHA



## Koçyîgît: Jin li hemberî tundiyê bêparastin man

Parlamentera Qersê ya DEM Partiyê Gulistan Kiliç Koçyîgît diyar kir ku qeyûman piştî dest danîn ser şaredariyan yekser êriş birin ser saziyên jin, ciwan, çand û ziman û got, "Mejiyê qeyûm xwest ku jinan ji her qadê bibe."

https://anfkurdi.com/jin/kocyigit-jin-li-hemberi-tundiye-beparastin-man-177494

Çavkanî:ANF



## [Siyasetmedar Sebahat Tuncel jî dest bi greva birçîbûnê dike](https://jinhaagency.com/ku/rojane/siyasetmedar-sebahat-tuncel-ji-dest-bi-greva-bircibune-dike-42823)

Siyasetmedara kurd Sebahat Tuncel diyar kir ku ji bo vekirina rêya çareseriyê ya ji Îmraliyê re derbas dibe, dest bi greva birçîbûnê dike. Sebahat Tuncel got, “Banga me ew e ku her kes li dora vê çalakiyê bibe xelek û têkoşînê mezin bike.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/siyasetmedar-sebahat-tuncel-ji-dest-bi-greva-bircibune-dike-42823

Çavkanî:JINHA




## [Peywirdarkirina lijneya rêveberiya MKG’ê hate diyarkirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/peywirdarkirina-lijneya-reveberiya-mkg-e-hate-diyarkirin-42822)

Di peywirdarkirina lijneya rêveberiyê ya MKG’ê de Roza Metîna weke seroka komeleyê hate hilbijartin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/peywirdarkirina-lijneya-reveberiya-mkg-e-hate-diyarkirin-42822

Çavkanî:JINHA



## Dibe ku xwişka zaroka Êzidî ya di bin parastinê de ye li ba malbata DAIŞ'ê be

Hat îdiakirin ku xwişka keça Êzidî ya 11 salî ku wê dabûn malbata DAIŞ’ê ya wê revandibû, piştî nûçeya di raya giştî de belav bû ket di bin parastinê jî li ba heman malbatê ye. Dayika zarokan dixwaze ji bo karûbarên hiqûqî derbasî Tirkiyeyê bibe.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dibe-ku-xwiska-zaroka-Ezidi-ya-di-bin-parastine-de-ye-li-ba-malbata-daiS-e-be-42819

Çavkanî:JINHA




## Tulay Hatîmogullari: Tevî siyaseta we ya xwînrêj em ê aştiyê pêk bînin

Hevseroka Giştî ya DEM'ê Tulay Hatîmogullari bertek nîşanî hedefgirtina partiya wan a piştî êrîşên li ser sînor da û got: "Tevî siyaseta we ya xwînrêj em ê aştiyê pêk bînin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/tulay-hatimogullari-tevi-siyaseta-we-ya-xwinrej-em-e-astiye-pek-binin-42818

Çavkanî:JINHA



## Rêxistina Mafê Mirovan a Îranê: Samîra Sabziad hate darvekirin

Rêxistina Mafê Mirovan a Îranê ragihand ku Samîra Sabziad ku ev 10 sale li girtîgehê dihat girtin ji aliyê rejîma Îranê ve hatiye darvekirin û got: “Samîra bû qurbana tundîtûjiya di nava malê de û îro jî bû qurbana rejîma Îranê.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rexistina-mafe-mirovan-a-Irane-samira-sabziad-hate-darvekirin-42812

Çavkanî:JINHA



## ‘Li herêma Kurdistanê jin di navendên biryardanê de nînin’

Siyasetmedar Gulîstan Seîd bal kişand ku li herema Kurdistanê jin di navendên biryardanê de nînin û got beşdariya jinan di navendên biryardanê de nîşaneya wekhevî û demokrasiyê ye.

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/li-herema-kurdistane-jin-di-navenden-biryardane-de-ninin-42806

Çavkanî:JINHA



## [Berxwedana jinên Rojhilat û Îranê didome – PANORAMA](https://jinhaagency.com/ku/dosya/berxwedana-jinen-rojhilat-u-Irane-didome-panorama-42805)

Jinên Îran û Rojhilatê Kurdistanê ku bi şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" li hemû qadên jiyanê berxwedanê mezin kirin, bi têkoşîna xwe ji hemû cîhanê re bûn mînak, ji aliyê Komara Îslamî ya Îranê ve rastî gelek zextên dijmirovahî hatin.

https://jinhaagency.com/ku/dosya/berxwedana-jinen-rojhilat-u-Irane-didome-panorama-42805

Çavkanî:JINHA




## Çima pêwîst dike rola jinan di saziyên çapemeniyê de bihêz be?

Hebûna jinan di navendên sereke yên hemû qadan de xwedî girîngiyeke taybete, nemaze medya ku hêza arastekirin û hişyarkirina ferdên civakê ye, lewra rewşenbîr û çalakvanan pêwîstî bi xurtkirina rola jinê di medyayê de dibînin.

https://rojnews.news/ku/?p=296665

Çavkanî:ROJNEWS



# ‘Pêwîste jin li beramberî reftarên ku li dijî wan tên kirin hişyar bin’

Çalakvana mafên jinan Prof. Jiya Ebas da zanîn ku gelek giringe jin asta wan a hişyariyê li beramberî reftarên ku li beramberî wan tên kirin hebe. Jiya Ebas got, gelek nêzîkatî li beramberî jinan tên kirin û wisan fam dikin ku ji ber ew jinin, normale ew nêzîkatî li beramber tên kirin.

https://rojnews.news/ku/?p=296389

Çavkanî:ROJNEWS




# Li Teqteq mêrek keça xwe gulebaran kir

Di saetên sibehê de li bajaroka Teqteq kesek gule li keça xwe da û wê bi giranî birîndar kir.

https://rojnews.news/ku/?p=297073

Çavkanî:ROJNEWS



## Balafîra ku wêneyê Jîna Emînî li sere destûr nehat dayîn dakeve

Derhênerê Îtalî Enrique Pîñeyro, ragihand ku balafîra wêneyê Jîna Emînî ya li Îranê hat qetilkirin li sere destûr nehat dayîn li Misirê dakeve.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-balafira-ku-weneye-jina-emini-heye-desture-daketine-nehat-dayin-42836

Çavkanî:JINHA




## Meclisa Jinan a Partiya DEM'ê: Em ê weke jin hesabê îşkenceyê bipirsin

Meclisa Jinan a Partiya DEM'ê, diyar kir li Bakirkoyê jinên bi îşkenceyê hatin binçavkirin û wiha got: "Em îşkencekar û tacîzkarên we nas dikin û em ê weke jin hesab ji wan bipirsin!"

https://jinhaagency.com/ku/rojane/meclisa-jinan-a-partiya-dem-e-em-e-weke-jin-hesabe-iskenceye-bipirsin-42834

Çavkanî:JINHA

# ‘Divê Zagona Ceza ya ku 60 sal in di meriyetê de ye were guhertin’

Parêzvana mafên mirovan Kabîra Shater, diyar kir ku Zagona Ceza ya ku li Mexribê ji sala 1963’yan ve di meriyetê de ye divê were guhertin û bal kişand ku bi taybetî ji bo sêcên li dijî jin û zarokên keç divê zagon hebe.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-zagona-ceza-ya-ku-60-sal-in-di-meriyete-de-ye-were-guhertin-42832

Çavkanî:JINHA



# Jinên Afganistanê di sala 2023’an de jî li dijî polîtîkayên Talîbanê li ber xwe dan – PANORAMA

Talîbanê ku di 15’ê Tebaxa 2021’an de rêveberiya Afganîstanê desteser kir, tişta ewilê mudaxale kirina gelek qadên aîdê jinan bû. Jinên ku li dijî polîtîkayên dijminatiya jinan ê Talîbanê li ber xwe dan, di sala 2023’an de jî dev ji têkoşînê bernedan.

https://jinhaagency.com/ku/dosya/jinen-afganistane-di-sala-2023-an-de-ji-li-diji-politikayen-talibane-li-ber-xwe-dan-panorama-42829

Çavkanî:JINHA



## Gumanbarê Zeynebê hat girtin

MÊRDÎN - Jina bi navê Zeynep Gul Kuşçu ya 31 salî ji aliyê Ahmet Tahîr Erat ku dest jê berdabû ve hatibû qetilkirin. Gumanbar Ahmet Tahîr Erat, hate girtin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224065

Çavkanî:JINNEWS




## Komeleya Jinan a Rosayê di 6 saliya xwe de ye

AMED - Komeleya Jinan a Rosayê 5 sal li dû xwe hişt. Endama Lijneya Rêveberiyê Ezgi Sıla Demir têkildarî salvegera damezrandina Komeleya Jinan a Rosayê de wiha got:"Rihê me bi qasî ku li hemberî negatîfbûnê têk naçe, zindî ye. Em ê têkoşînê bidomînin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224034

Çavkanî:JINNEWS



## [Peyama jinan a 2024'an: Em ê bi têkoşînê sersalê pêşwazî bikin!]

STENBOL - Nûnerên rêxistinên jinan dan zanîn ew ê sekna xwe ya bi biryar a di qada têkoşînê de di sala 2024'an de jî dewam bikin û wiha gotin:"Me wekî jin sala 2023'yan bi têkoşînê qedand. Em bi vê têkoşînê diçin sala nû. Li dijî tundiya mêr dewletê li dijî zext û îşkenceyê em ne bi tenê ne em ê têkoşîna xwe bidomînin."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224026

Çavkanî:JINNEWS



## ‘Jin di malê de bi dewleteke biçûk re têdikoşin’

RIHA - Endama Lijneya Rêveber a Komeleya Piştevaniya Jinê ya Yaşamevî Sevînç Îzol li dijî pirsgirêkên jinan got, “Tenê parêzvanî tespîtkirina pirsgirêkê ye. Heta ku em bi awayekî wekhev û azad bijîn ev têkoşîn dê bidome.”

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224024

Çavkanî:JINNEWS



## TAJÊ: Bi vîn û têkoşînê em ê serî li hemberî êrîşan netewînin

Rêveberiya Xweser a Şengalê û Tevgera Azadiya Jinên Êzidî li dijî êrişên dewleta Tirk ên li ser Şengalê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de hat gotin ku ew ê li dijî êrişan serî netewînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/tajE-bi-vin-u-tekosin-em-e-seri-li-hemberi-erisan-netewinin-42853

Çavkanî:JINHA




## Girtiya siyasî Narges Mansourî dest bi greva birçîbûnê kir

Yek ji girtiyên siyasî yên Îranê Narges Mansourî, ji bo şermazarkirina biryara dadgehê ya têkildarî firotina milkên dayika wê daye, dest bi greva birçîbûnê kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/girtiya-siyasi-narges-mansouri-dest-bi-greva-bircibune-kir-42852

Çavkanî:JINHA



## [Zexta xwarinê li ser girtiyên di greva birçîbûnê de ne tê ferzkirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/zexta-xwarine-li-ser-girtiyen-di-greva-bircibune-de-ne-te-ferzkirin-42850)

Çukurova TUAYDER'ê da zanîn ku li ser girtiyên ku li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Manavgatê ya Antalyayê di greva birçîbûnê de ne xwarin hatiye ferzkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zexta-xwarine-li-ser-girtiyen-di-greva-bircibune-de-ne-te-ferzkirin-42850

Çavkanî:JINHA




## [Wêneyê ‘Giraniya torbeyekî’ ya Eylem Akdag hêjayî xelatê hat dîtin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/weneye-giraniya-torbeyeki-ya-eylem-akdag-hejayi-xelate-hat-ditin-42848)

Xelata Rojnamegerên Serkeftî ya 2023’an a Komaleya Rojnamegerên Hemdem hat eşkerekirin. Rojnameger Eylem Akdag bi wêneya xwe ya bi navê "Giraniya Çenteyê" hêjayî xelatê hat dîtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/weneye-giraniya-torbeyeki-ya-eylem-akdag-hejayi-xelate-hat-ditin-42848

Çavkanî:JINHA



## 'Berdêla şer jin didin'

Şer li ku derê û li kîjan axê dibe bila bibe, herî zêde jin jê bi bandor dibin. Seroka Yekitiya Jinên Lubnanê Îlham Mubarek, bal kişand ku koçberiya bi darê zorê di jiyana jinan de dibe sedema rewşên zor û zehmet û bi xwe re encamên cidî tîne.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/berdela-ser-jin-didin-42846

Çavkanî:JINHA



## Jinên Sûriyeyî ji bo azadiyê pêşengiya berxwedanê dikin – PANORAMA

Gelên Sûriyeyê di nava pevçûn, krîza aborî û koçberiyê de bi salan e ji bo jiyanê têdikoşin. Di sala 2023'yan de jî ji bo hilumeta Şamê biguhere û demokratîkbûna Sûriyeyê di nava çalakiyan de bûn.

https://jinhaagency.com/ku/dosya/jinen-suriyeyi-ji-bo-azadiye-pesengiya-berxwedane-dikin-panorama-42845

Çavkanî:JINHA



## Komeleya Jinan a Rosa di sala xwe ya 6’emîn de ye

Komeleya Jinan a Rosa ku di sala 2018’an de li Amedê ji bo têkoşîna li dijî her cure tundiyê li ser jinan derket rê, tevî hemû zextan, polîtîkayên şerê taybet û tacîzên darazê jî dev ji qadan û jinan bernade.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/komeleya-jinan-a-rosa-di-sala-xwe-ya-6-emin-de-ye-42844

Çavkanî:JINHA




## Hêviya jinan a sala 2024’an: Aştî, azadî, hebûn û edalet e!

Jinên Amedê li ser pirsa “Hûn ji sala 2024’an çi hêvî dikin” bal kişandin ser krîza aborî û şîdeta li ser jinan û bendewariya xwe ya ji bo aştî, edalet û azadiyê anîn ziman.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/heviya-jinan-a-sala-2024-an-asti-azadi-hebun-u-edalet-e-42843

Çavkanî:JINHA



## Gulseren Yolerî: Li dijî îşkenceyê têkoşîn şert e

STENBOL - Seroka ÎHD’a Stenbolê Gulseren Yolerî diyar kir ku seranserê salê tecrîd û şer giran bûye, binpêkirinên mafan zêde bûne û got: “Hewce heye ku li dijî van polîtîkayan têkoşînek xurt bê meşandin. Em ê têkoşîna xwe bidomînin. Divê her kes di vê têkoşînê de hevpar be.”

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224090

Çavkanî:JINNEWS



## 'Guherîn û veguherîna siyaseta herêmî bi jinan pêkan e'

MÊRDÎN - Seroka Tora Tevgirtin û Wekhevî ya Kûrewî Ayşe Kaşikirik, diyar kir ku guherîn û veguherîn bi jinan mumkun e û got: "Bi taybetî jî bijartina keyayên jin dê bandorê li ser guherîna civakê û siyaseta herêmî bike."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/224081

Çavkanî:JINNEWS



## Nexweşa şekir û KOAH’ê Hanîfe Arslan nayê berdan

Rewşa girtiya nexweş a 76 salî Hanîfe Arslan her ku diçe giran dibe. Keça wê Reyhan Oren diyar kir ku divê demildest dayika wê tedawî bibîne û got: “Saziya Tiba Edlî û nexweşxane sûc dike.”

https://anfkurdi.com/jin/nexwesa-sekir-u-koah-e-hanife-arslan-naye-berdan-177616

Çavkanî:ANF



## ‘Hikûmeta Herêmê sedemê zêdebûna rêjeya tundiya li ser jinê ye’

Çalakvana Mafên Jinan û Parlamentera Berê ya Herêma Kurdistanê Peyam Ehmed, da zanîn ku amarên heyî nîşan didin ku li Herêma Kurdistanê tundiya li ser jinan roj bi roj zêdetir dibe. Peyam got, yek ji sedemên zêdebûna rêjeya tundiya li ser jinan, siyaseta hikûmetê bi xwe ye.

https://rojnews.news/ku/?p=297211

Çavkanî:ROJNEWS



**Nûçeyên herêmî**

## Ji jinan peyama li dijî şerê taybet: Dem dema parastinê ye

Jinên navçeya Zirganê ku her roj di bin topbaran û êrîşên dewleta Tirk de dijîn, li ser polîtîkayên şerê taybet a dewleta Tirk a valakirina Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê axivîn û gotin: "Dem dema parastinê ye."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-jinan-peyama-tekosine-dem-dema-parastine-ye-42713

Çavkanî:JINHA



## Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jin bi serkeftinê bi pêşve diçin – PANORAMA

Jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, piştî şoreşa ku pêşengiya wê kirin, niha jî ji bo avakirina jiyana wekhev û azad bi rêxistibûnê têkoşîna xwe didomînin, bi serkeftinê bi pêşve diçin.

https://jinhaagency.com/ku/dosya/li-bakur-u-rojhilate-suriyeye-jin-bi-serkeftine-bi-pesve-dicin-panorama-42716

Çavkanî:JINHA



# Çîrokeke têkoşînê; Sebîha Mihemed

Sebîha Mihemed ji bo ku debara malbata xwe peyda bike, fêrî sererastkirina papûr û sobeyan bûye.

https://hawarnews.com/kr/cirokeke-tekosine-sebiha-mihemed

Çavkanî:ANHA



# Mala Jin a Zirganê: Jinan rê neda hişmendiya baviksalarî û dagirkeriyê

Rêvebera Mala Jin a navçeya Zirganê ya Kantona Hesekê Sediya Eydo da zanîn ku ew di nava êrîşan de dikaribûn di salekê de li 19 dozên jinan binêrin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/mala-jin-a-zirgane-jinan-re-neda-hismendiya-baviksalari-u-dagirkeriye-42781

Çavkanî:JINHA



## Bi ta wêne xêz dike: Dixwazim projeya xwe berfireh bikim

Robîn Omer a 22 salî ji bajarê Qamişlo ye bi hunera wênexêziyê û berhemên xwe yên ji tep, ta û bizmar projeyeke xwe ya xweser ava kiriye. Robîn dibêje ku ew dixwaze di pêşerojê de projeya xwe berfirehtir bike.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/bi-ta-wene-xez-dike-dixwazim-projeya-xwe-berfireh-bikim-42782

Çavkanî:JINHA



## Jinên li kampan di rewşên zehmet de ne

Jinên koçber ên li kampên Girê Spî û Waşûkanî hemwextî sermaya zivistanê, zêdebûna pêdiviyên malbatên wan û tunebûna alîkariyan, ketine rewşeke zehmet.

https://hawarnews.com/kr/Jin%C3%AAn-li-kampan-di-rew%C5%9F%C3%AAn-zehmet-de-ne

Çavkanî:ANHA



## Jinên Ermen: Hevpeymana Civakî riya çareseriyê ye lê rastî êrîşan tê

Pêkhateyên Ermen teqez kirin ku Hevpeymana Civakî bi îrade û nêrîna gelê herêmê pêk hatiye lewma li dijî vê gavê êrîş li ser herêmên Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tên û gotin: “Xeta me xeta berxwedanê ye.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-ermen-hevpeymana-civaki-riya-careseriye-ye-le-rasti-erisan-te-42826

Çavkanî:JINHA



## Di çemê Cexcex ê li Til Birakê de jinek noq bû

Xelkê navçeya Til Birakê cenazeyê jinekê ji çemê Cexcex ê li başûrê Til Birakê ya kantona Cizîrê derxist.

https://hawarnews.com/kr/di-ceme-cexcex-e-li-til-birake-de-jinek-noq-bu

Çavkanî:ANHA



## Li ser Şehbayê ji aliyekî ve dorpêç ji aliyekî ve jî êrîş didomin

Ji ber rêgiriya hikumeta Şamê li ser kantona Şehbayê û êrîşên dagirkerî ya dewleta Tirk li ser herêmê, jiyana şêniyên li wan deveran di nava şert û mercên gelek zehmet de ye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-ser-Sehbaye-ji-aliyeki-ve-dorpec-ji-aliyeki-ve-ji-eris-didomin-42841

Çavkanî:JINA



## 'Ji bo parastina şoreşa Rojavayê Kurdistanê em ê serferber bibin'

Rêveberên jin ên kantona Firatê helwestên xwe yên li dijî êrîşên dewleta Tirk anîn ziman û gotin ku dewleta Tirk dixwaze şoreşa Rojavayê Kurdistanê tesfiye bike û binketina xwe beşêre, lê ji bo parastina destkeftiyên xwe ew ê seferber bibin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-parastina-soresa-rojavaye-kurdistane-em-e-serferber-bibin-42840

Çavkanî:JINHA



Kongra Star

30/12/2023